Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar :862 9-Gulan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Bersiva jimara borî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	O	X	■	M	L	L	L	T	Î
2	D	E	H	■	W	■	L	■	C
3	E	■	I	R	■	Î	M	H	A
4	■	P	Z	■	E	S	A	■	D
5	M	A	R	S	■	A	S	A	■
6	A	R	■	S	A	L	■	D	E
7	L	A	L	■	D	■	K	I	N
8	■	D	■	K	A	B	A	L	A
9	N	Î	S	A	N	■	L	■	M

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■		■	
2		■			■				
3						■			■
4	■				■			■	
5		■		■					
6			■				■		
7	■				■				
8			■			■			
9					■				

RAST-ÇEP

1. Navbera du tiştan
2. Baneşaneke gazîkirinê... (Siyabend …) Destaneke me
3. Ava ji ber helîna berfê çêdibe... Yezdanekî misrî
4. Rengek... Tevgera hewayê
5. (… Bedirxan) Balerîneke kurd
6. Kurtiya Antîmonê... Pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê dide... Vexwarina sereke
7. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Alîf, xwarina sewalan
8. Zîl, ji kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Daçekek... Qewmê guh nedayş pêxemberê xwe Hûd û ji hêla Xwedê ve hatî tinekirin
9. Vexwarineke bi alkol... Encam, netîce

JOR-JÊR

1. Hesinê ku li binê piyê hespan dixin... Rêxistina polîsan ya naziyan... Cureyekî xwînê
2. Îşaret, şop... Tiştên ku tekildarî reşayiyê ne
3. Pênûs
4. Postê gurandî... Birûmet, birêz
5. Xanedana qiraliyeta Vîetnamê
6. Bersivan pejirandinê, erê
7. Avayiya mezin ya ku hikumdar yan jî serokdewlet lê dimînin... Ajela xwedî têjik
8. Li hin herêman li şûna 'dayîk'ê tê gotin... Notayek... Bi rûsî erê
9. Dengdêrên "pêça"yê... Dua, niyaz

Quncika têgînan

Bandor	Kartêkiri, hîkarî, kelij, werêç, te´sîr
Gengaz	Tişta dibe ku bibe yan bê kirin. Mûhtemel
Girîng	Binirx, hêja, watedar, mûhim
Pankart (Fransî)	Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: Di çalakiyê de parkata "Bimire Dagîrkerî" hat vekirin.
Çalak	Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: Mirovekî çalak e
Pêvajo	Ji bo demeke diyar: Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.
Pêwendî	Têkilî
Plan (Fransî)	Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.
Proje (Fransî)	Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: Projeya ava bajêr dest pê kir.
Protesto (Îtalî)	Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: Kurdan Peymana Lozanê protesto kir

"Berxikê min di nava zeviyan de bi keyfxweşî digere"

Navenda Nûçeyan /Qamişlo

Janet Arkwright wiha diyar kir, "berxikê me astengdar bû, lê min baş dizanî em dikarin çareyekê bibînin."

Dibe ku ev çîrok jib o hin kesa pir balkêş be û hin kes jî pir bê wate jî bibînin. Lê ev rastiyeke ku mirovayî tevgere xwezayi ye. Li Brîtaniyê li kantonekê rojavayê West Yorkshire, Janet Arkwright ya 44 salî bi dilovanî û hestiyariya xwe karî ji berxikê astengdar re jiyanake nû biafirîne.

Janet Arkwright derbarê wî de wiha got: "Di nava sewalên me de du berxik ji dayîk bûn. Lê mixabin yek ji wan, piştî ku me bir nava zeviyan nexweş ket. Dema ez serê sibê ji xew rabûm min dît ku dayîka wê nêzê wî nabe û vê yeke ez pir xemgîn kirim. Me ew bir gel bijîşkê beyîterî û wî ji me re wiha got, 'ji ber nexweşiyê her dû lingên berxikê we felc bû ne. Divê her tim paldayî be û em nikarin jê re tiştekî bikin.' Berxikê me astengdar bû, lê min baş dizanî em dikarin çareyekê bibînin.'

Janet Arkwright axaftina xwe wiha bi dawî kir: " Ji bo wê me korsiyeke bi tekel jêre anî, da karibe bi rehetî tevbigere. Ji wê rojê heta niha berxikê min kêfxweş di nava zeviyan de digere. Lê tenê asengiyeke wî heye êdî nikare bi tena xwe palde. Ji ber wê dema dixwaze pal de berê xwe dide, me da ku em wî ji kursiyê vekin û rehet pal bide."

Tûrikê çîvanokan

Di tûrikê me de îro çîvanoka li ser pîrê heye. Çawa ku tê zanîn dapîr û nevî ji hev pir hes dikin. Dibêjin, zarok qaqil in, nevî kakil in. Heta dibêjin, ji bo dapîr û bapîran nevî ji zarokên wan şîrîntir in. Em binêrin ka nevî li sar pîrika xwe çi dihizirin û çi dibêjin.

PÎRÊ

Pîrê pîra didanhûr	Nîvişk digre ji meşkê
Nan datîne binê tûr	Dew dertînee ji keşkê
Dema saet dibe neh	Pîrê pîra serkofî
Riya kalo dide şeh	Benika dike girofî
Pîrê pîra ehnîxîz	Ji bo kalo dirêse
Rûn datîne binê dîz	Şîva pîrê helîse
Qelyê têxe binê kûz	Pîrê pîra dilkovan
Heban tijî beyv û gûz	Ji bo kalo dilovan

Pêngava li dijî çeteyên DAIŞ`ê dewam dike

Gava yekê ya Operasyona Mirovî û Ewlehiyê ya ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê 28`ê Adarê destpê kiribû û şeş rojan dewam kir, serkeftî derbas bû. Li ser vê operasiyonê berdevkê giştî yê Hêzên Ewlekariya Hundirîn Elî El Hesen diyar kir ku, pêngava xwe ya kampa Holê serkeftî bi dawî kir.*R-2*

Ciwan Mistefa: WHO 645 derzî tenê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê re şandine

Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa got, "WHO' 645 derzî tenê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê re şandine û bi vî awayî rêgezên xwe binpê dike û ev helwest ji piçûkxistina civakê ye." *R-2*

Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 862 9-Gulan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Jinê ji tinebûnê hebûn afirand

Ji bo em analîzeke rast li ser rewşa jina ku li Sûrî dijî bidin, divê em dîrokê baş analîz bikin. Çimkî heqîqeta kû em lê digerin di nava rûpelê dîrokê de hatiyê wendakirin û li gorî berjewendiyên hêzên serdest biçîmeke nû hatiye dayîn.

RÛPEL-3

"Erdogan di çavên çeteyên DAIŞê de xewna Osmanî dibîne"

"Divê em bi vîna xwe ya azad kar bikin"

Sekreterê giştî yê Partiya Demokrata Kurdî ya Sûrî Cemal Şêx Baqî diyar kir ku Nirxandinên serkirdeyên ENKSê li ser ragihandinê dikin ne nû ne û ji destpêka van guftûgoyan de, bihêrs peyîvên derveyî rêzê dikin û êrişî PYNKê dikin. *R-5*

Dewleta tirkî û şerê avê

Ji 27ê Çileya îsal ve, dewleta dagirker a tirkî destdanî ser 80% ji ava çemê Firatê. Piştî ku Enqerê di salên berê de bend û projeyên xwe li qeraxên çemê Dîcle û Firat çêkirin, çavkaniyên avê kontrol kirin û serweriya xwe li ser deverên sînorê cîranên xwe ferz kirin. Mihemed Emîn Nayîmî li ser vê yeke diyar kir ku, ew sucên Tirkiyê dişopînin û belge dikin. *R-6*

Mizgîn dengê azadiyê ye

Şehîd Mizgîn xwediya dengê xweş, bi stranên xwe yên şoreşgerî hezkirina xwe di nava dilê her Kurdekî li cîhanê çand. Ji bo azadiya gelan û mirovahiyê bi salan têkoşîn kir. Rûxmê ku ev 29 sal ser şehadeta hunermend Mizgîn (Xurbet Idon) derbas dibe, lê hîn dengê wê mala her kurdekî di xemîlîne û qadên şoreşê zindî dike. *R-7*

Pêngava li dijî çeteyên DAIŞê dewam dike

Gava yekê ya Operasyona Mirovî û Ewlehiyê ya ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê 28`ê Adarê dest pê kiribû û şeş rojan dewam kir, serkeftî derbas bû. Li ser vê operasiyonê berdevkê giştî yê Hêzên Ewlekariya Hundirîn Elî El Hesen diyar kir ku, pêngava xwe ya li kampa Holê serkeftî bi dawî kirine.

Darîn SILÊ/Qamişlo

Li Rojava kampa Holê yek ji kampên herî mezin û bi xetere. Çimkî jimareke mazin ji malbat, rêveber û serkêşên çeteyên DAIŞê lê dijîn. Hata niha jî ev xeterî dewam dike. Ji despêka vê salê zêdetirî 47 kesên ku di hundirê kampê li dijî çeteyan dixebitin, li ser destên malbatên çeteyan, hatin kuştin.

“DIVÊ ÇETEYÊN DAIŞ`Ê LI HERÊMÊN RÊVEBERIYA XWESER WERIN DADGEHKIRIN”

Berdevkê giştê yê Hêzên Ewlekariya Hundirên ya bakur û rojhilatê Sûriyê Elî El Hesen li ser rewşa kampa Holê û operasiyona xwe wiha axivî; “Opersyona Mirovî û Eewlehiyê ya Kampa Holê, bi piştgirya YPJ, YPG û QSD destpêkir û bi awayekî pir serkeftî bidawî bû. Di vê opersyonê de zêdetirî 5000 hêzên me tevlî bûn. Di pêngavê de 125 çeteyên DAIŞê hatin girtin. Di nav wan de jî nêzî 20 kesên rêveber hebûn. Herwiha hêzên me du zilamên ku destên wan di kuştina xelkê Îraqê de yên li kampê hatin kuştin, hebûn.”

Elî ELHesen diyar kir ku piştî pêngava yekê bi dawî bû, wan dest bi lêpirsînê bi girtiyan re kir û wiha pê da çû: “Di ancama lêpirsînê de me 27 kesên din ji çeteyan girt. Heta niha jî lêpirsîn dewam dike. Herwiha van çeteyan ne li hundirê kampê, li derve jî sûc û karên qiirêj yên li dijî mirovahiyê kirine. Sûcên ku çeteyên DAIŞ`ê li kampê kirîn, di lêpirsînê de îtîraf dikin.”

“HÊZÊN ME DI HEMÛ PÊNGAVAN DE BI HEV RE DIBIN ALÎKAR”

Elî destnîşan kir ku, hebûna çeteyan li ser vê xakê xetere, ji ber wê Rêveberiya Xweser bang li dewletên navneteweyî kir ku her dewletek welatiyên xwe bibe welatê xwe. Herwiha Elî got; ji ber ev çete sûc li ser vê xakê kirine û xelkê wê koçber kirin. Divê ew li herêmên Rêveberiya Xweser werin dadgehkirin piştre wan radestî welatên wan bikin.

Elî El Hesen anî ziman ku hêzên Koalîsyona Navneteweyî jî bi wan re alîkarin û got; “Hêza Koalîsypnê û hêzên Sûriya Demokratîk, her demê piştgiriyê dide hêzên Ewlekariya Hundirîn û di pêngavên dijî çeteyan, bi me re dibin alîkar.”

‘Artêşa dagîrker li gundê Mielek yê Eyn Îsa bargeheke din ava dike’

Çavkaniyeke leşkerî ragihand ku artêşa tirkî ya dagîrker li gundê Mielek yê rojavayê Eyn Îsa baregeheke din ya leşkerî ava dike.

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê piştî dagîrkirina bajarê Girê Spî, li derdora navçeya Eyn Îsa û gundewarê wê gelek baragehên leşkerî ava kirin.

Di wan baragehan de radarên çavdêriyê û gelek teknîkên şer bi cih kirine. Artêşa tirkî ji wan baregehan êrişî navçeya Eyn Îsa û gundewarê wê dike.

Çavkaniyeke leşkerî ragihand ku dewleta tirkî ya dagîrker li gundê Mielek yê rojavayê Eyn Îsa barageheke din ava dike. Berî wê jî li nêzî heman gundî baregehek hatibû avakirin.

Gundê Mielek her tim dibe amanca êrişên artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê. Armanca dewleta tirkî ya dagîrker ya avakirina baragehên leşkerî, ew e ku herêmê dagîr bike.

ANHA

Ciwan Mistefa: WHO 645 derzî tenê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê re şandine

Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa got, “WHO’ 645 derzî tenê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê re şandine û bi vî awayî rêgezên xwe binpê dike û ev helwest jî piçûkxistna civakê ye.”

WHO di vê dawiyê de 203 hezar derzî ji hikumeta Şamê re şandin û got, wê beşek ji derziyan ji bakur û rojhilatê Sûriyê re şandiye û wê bi balafirgeha Şamê bigihîne Qamişlo. Lê diyar bû ku 645 derzî tenê ji herêmê re şandine.

Têkildarî mijarê, Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa axivî û got, ev reftara WHO siyaseta têkbirina nirx û rêgezên xwe ye.

Mistefa wiha got: “WHO ne adil e û girîngiyê nade 5 milyon welatiyên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê. Ev reftar ji welatiyên herêmê re piçûkxistin e.”

Mistefa da zanîn ku WHO ji dema berbelavbûna vîrûsa Korona li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ve ti girîngî nedaye û ti made û pêdiviyên tenduristiyê ji herêmê re tevî bangên berdewam neşandine neşandina û wiha axivî: “Made, alav û pêdiviyên tenduristiyê ji tevayiya herêmên cîhanê re hatine şandin, lê WHO ti girîngî neda herêmên me û ev jî nîşana nakokiyên di rêgez û siyasetên wê de ye.”

Mistefa bang li WHO kir ku di siyaseta xwe de adil be û rola mirovî bilîze û di karên xwe de wekheviyê pêk bîne.

ANHA

“Qutkirina avê karesat e, bêdeng nemînin”

Navenda Nûçeyan/Qamişlo

Ji destpêka Sibata 2021an dewleta Tirkî ya dagîrker, xelkê Sûrî ji ava Firatê bêpar hiştiye. Bi taybetî di çend rojên dawî de weke ku di wêneyan de jî hat diyar kirin, rêjeya ava çemê Firatê li bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî karesetî kêm bûye û gihaştiye asta herî kêm. Ev yek jî metirsiyekê li cem gel çêdike. Dewleta Tirkî lihevkirinên navneteweyî binpêdike û para Sûrî û Iraqê, ji avê qut dike.

QUTKIRINA AVA FIRATÊ KARESATEKE MIROVÎ DERDIXE HOLÊ

Ji ber qutkirina ava çemê Firatê, jimarek mezin ji xelkê bakur û rojhilatê Sûrî li ser rûpelên mediya civakî, pêngavekê “Par Sûrî ji ava Firatê berdin. Bila dewlatên navneteweyî bêdeng nemînin.” Destpêkirine. Li ser vê mijarê ji rojnemevan rapor û dosiyên berfireh, ev sûc û bêdengiya dewletên navneteweyî, şermezar kirin.

Rêvberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê berî demekê hişyarî da ku, karîseteke mirovayî derdikeve holê û tenduristî, çandinî û elktirîk jî digre nav xwe. Ji ber qutkirina ava çem, gemar li deverê kom dibe, ev yek jî karîseteke xwezayî ye.

Desteya Eliktirîkê ya herêma Cizîrê û Firat ragihand ku ji ber qutkirina avê, di rojê de 8 seatan wê eliktirîk hebe. Rêvberiya Bendavan ya bakur û rojhilatê Sûriyê, dewletên navneteweyî vexwendin ku li hember van kiriyaran bêdeng nemînin û divê navenda avê ya Elok ji destê dewlat Tirkî derxînin. Eger rewş wiha bimîne wê xelkê Sûrî bigiştî bê ava bimîne. Herwiha wê zerareke mezin bigihêje çandiniya herêmê jî.



“WÊ HETA KENGÎ REWŞ WIHA BE”

Li ser vê mijarê rojnameya me nerîna mamoste Lînda Elî girt. Lîna diyar ku ew ji qutkirina avê zehmetiyan dikşînin û wiha got; “Ev demeke dirêje em ji ava Elok qut bûne. Berî 6 rojan nîv seatê av hat, lê ji ber kêmbûna wê, ti kesî pêre negihişt ku qazanên malê dagirin.”

Lîna Elî li ser hatina sehrîcên avê axaftina xwe bidawî kir: “Ji bilî bihabûna dagirtina ava sehrîca, her du hefteyan carekê tê. Em ti sûdê jî jê nagirin, çimkî ava wan gemare. Raste bîr li bajarê me hene, lê ji ber tinebûna eletrîkê, xelkê wê sûdê ji nagirin û ava gelek bîran jî, tehle. Ma wê heta kengî rewş wiha be, em bang li dewletên navneteweyî dikin ku bêdeng nemînin.”

Mizgîn dengê azadiyê ye

Hediya HISÊN/Qamişlo

Şehîd Mizgîn xwediya dengê xweş, bi stranên xwe yên şoreşgerî hezkirina xwe di nava dilê her Kurdekî li cîhanê çand. Ji bo azadiya gelan û mirovahiyê bi salan têkoşîn kir. Rûxmê ku ev 29 sal ser şehadeta hunermend Mizgîn (Xurbet Idon) derbas dibe, lê hîn dengê wê mala her kurdekî di xemilîne û qadên şoreşê zîndî dike.

Heval Mizgîn yek ji jinên şoreşger ku ji têkoşîn û hunera xwe mîraseke Kurdistanî şoreşgerî afirand. Sala 1962 li gundê Bîlaysar yê girêdayî bajarê Batmanê di malbateke welatparêz de Mizgîn(Xurbet Idon) ji dayîk bûye. Di riya heval Mahsum Korkmaz (Egîd) re partî naskir. Sala 1980 Şehîd Mizgîn û komek ji hevalên xwe li Batmanê tevlî refên gerîla bûn. Piştî tevlî partiyê bû, berê xwe da Libnanê ku perwerda Rêber Apo re derbaz bibe. Dema ku perwerde xilas bû rêber Apo ew ji bo pêşxistina hunera Kurdî ew sand Ewropa. Li wir tevlî çalakiyên “Huner Kom” bû û bi navê ‘Hunermenda Dengxweş’ li Ewropa hat naskirin. Heval Mizgîn li kêleka çalakiyên hunerî, tevlî çalakiyên rêxistinî jî dibû. Herwiha rêvberiya Konfirasa Tevgera Jin ya Ewropa jî dikir.

Herwiha Şehît Mizgîn yek ji kesên ku koma Berxwedan dameziran ye. Lê Mizgîn ne tine hûnermend bû. Şoreşgereke ku xwe ji aliyê fikir, rêxistinî û piratîkî de jî xwe li pêş dixist. Bi hunera xwe rihê berxwedanê û tekoşînê di gelê kurd de pêş xist. Stranên wê yên şoreşgerî êşa gelê Kurd da pênasekirin û rihê jina Kurd ya azad û şoreşger afirand.

Sala 1990a Mizgîn dîsa berê xwe da çiyayê Kurdistanê. Li çiya bû fermandara herêma Xerzan. Sala 1992 berê xwe da Tatwan a bajarê Bitlîs ku li bakurê Kurdistanê. Di detekê wê de çek û di destekê de jî tembûra wê hebû. Di 11ê Gulana 1992 li wir şehîd bû. Gelek stranên şoreşgerî û folklorî bi kurdî û tirkî gotin.

“JI TINEBÛNÊ MIROV TÊ HEBÛNÊ”

Endamê koma Botan, Begîn Botan ku derdora 10 heyvan bi heval Mizgîn re jiyan kiriye ji me re axivî û got ku dema heval Mizgîn derbasî Qamişlo bû xebateke mezin kir. Di wê demê de jin wek pêşeng ne dihat qebûlkirin di civakê de. Milet digot, ‘ka wê jin civkekê çawa birêve bibe.’ Lê bi rojûşev xebatdikir. Diçû cem malbatan da ku dîroka kurda pê bide naskirin û ka çima dijmin dixwaze wan tine bike pê bide fêmkirin.

Bengîn li ser berxwedana ku Mizgîn li Qamişlo kirî axivî û anî ziman ku Mizgîn jineke bi vîn û israr bû û wiha pêda çû: “Bi zanebûn û bi danûstandinê hezkirina xwe di dilê her kesî de bi cih dikir. Roleke heval Mizgîn di kome Botan de jî heye, gelek hêz da hevalên xwe û her tim ji wan re digot ‘ji tinebûnê



mirov hebûnê diafirîne.’ Gelek malbat di riya heval mizgîn re rêxistin naskirin û tevlî partiyê bûn. Daxwaza wê tenê çoyîna çiyê bû û ev daxwaze pêk hat.” Mizgîn wek dengê kurdî yê resen, jina azad, şoreşger û aştîxwaz ket dîroka kurdan. Herwiha pêşenga azadî û şoreşgeriyê ye. Ji gelek hunermendên kurd re bû mînakek û gelek kes bûn şopdarên wê. Ji bo wê ti carî nayê jibîrkirin.

Destnivîsên Melayê Bateyî li gund tên parastin

Li gorî nûçeya Ajansa Mezopotamya (MA) berhemên alim û helbestvanê Kurd Melayê Bateyî ev 300 sal in li gundê wî, Batê tên parastin.

Melayê Bateyî yek ji pêşeng û danerê edebiyata klasîk ya kurdî ye ku di gelek waran de nimûneyên ewil yên edebiyata kurdî nivîsîne. Li gorî texmînên lêkolîneran Melayê Bateyî di navbera salên 1670-1750’yî de li gundê Batê yê girêdayî Bêşebaba (Elk) Şirnexê ji dayik bûye û li wir jiyaye. Herwiha gora wî niha li gundê Batê ye û ji bo civakê xwediya cihekî taybet e. Melayê Bateyî di babetên civakî û olî de jî pêşengiya civaka xwe kiriye û heta dawiya temenê xwe jiyaneke kurdewar jiyaye.

Li derdora 25 berhemên wî hene

Li gorî texmînan, tê gotin ku Melayê Bateyî di gelek babetan de berhem nivîsîne û bi giştî 25 heb berhemên wî hene. Lêbelê çawa ku di mijara berhemdariya

gelek alim û helbestvanên Kurd yên mayîn de jî dixuyê, ji wan berheman gelek kêm berhem gihîştine roja me ya îro. Jî bilî berhemên wendayî yên Bateyî berhemên wî yên herî zêde tên zanîn Mewlûda Kurdî, Dîwan, Hemayîl, Keşkûl e.

Destnivîsên berheman pîroz in

Melayê Bateyî yekem helbestvan û alim e ku di nav edebiyata kurdî ya klasîk de mewlûdeke bi kurdî nivîsiye. Mewlûda di nav gelê kurd de herî meşhûr e mewlûda Bateyî ye. Di nav

edebiyata gelek neteweyan de yek ji xezîneyên sereke jî destnivîsên berhemên helbestvan û aliman e. Li gundê Batê gelek destnivîsên Melayê Bateyî ji aliyê neviyên wî ve bi pêşk û baldariyeke hêjayî dîtinê ye, tên parastin. Gundî û melayê gund destnîşan dikin ku ew esehiya berheman ji nifşekê heta nifşekê hatiye ragihandin û niha ew wan destnivîsan di cihên taybet de diparêzin. Berhemên Melayê Bateyî ji bo şêniyên gund pîroz tên qebûlkirin û qîmeteke berbiçav ji bo berheman tê nişandan. Ji nasên Melayê Bateyî mela Nûrî Guzel derbarê mijarê de wiha dibêje: “Em wek nevî û nasên wî tên nasîn. Bi sedan salan in dapîr û bapîrên me li vî gundî jiyane. Li gor agahiyên pêşiyên me, ev destnivîs aîdê mewlûda Mela Husênê Bateyî ne û wî bi destê xwe nivîsiye. Ji bilî mewlûdê çend berhemên wî yên din jî hene.” Nûrî diyar dike ku berhemên Melayê Bateyî ji bo wan pîroz in û wiha dibêje: “Berhemên Melayê Bateyî dîrokî ne, mîrasên wî ne ku ji me re wek emanet hiştine. Ji ber wê jî ji bo me gelek hêja ne.”

Civak, Likam û Kes

Sîpan Şînda

Di nivîsa heftiya bûrî de me behsa likamên li kesan têne kirin û bandora wan ya erênî kiribû. Di vê nivîsê de emê li ser bandora likaman ya neyînî ya li ser derûniya kesan bisekinin. Gelek caran kes di nava civakê de lê digere ku quncikekê yan ji kunekê bibîne û xwe têxe têde da ku tu kes wî/wê nebîne. Ango civak jiyanê ewqas li kesî teng dike, ewqas li ser kesî de diçe, kesî ewqas dorpêç dike êdî kes ji rihê xwe dide sto! Civak her tiştê kesî di pîve, dixwaze kesî ji kesîtîyê derbixe û veguherîne tiştekê din. Welê li kesî tê, êdî kes xwe di nava civakê de weke girtiyeke di bin çavan de û civakê ji weke zabitê xwe dibîne. Ji ber wê ew nizane wê çawa xwe ji destê wî zabitê hinde pêstûriyê li ser wî/ê dike, hinde midexeleyî jiyana wî/ê dike, dixwaze wî/ê ji hiş, hest, kesayetî, bawerî, bîrdozî, şikl û şemal û hwd dûr bixe û têxe di qalibekî ku civakê çêkirî de. Êdî civak dixwaze ew cil û bergên ku civakê ji bo wî/ê dirûtî li wan bike û heta hetayê ji ew kes di bin wan cilan de be û ji xwe kirinê dane dira henê, divê ew kes wan cilan li ber xwe her strûtir bike, divê ew cil li ber kesî welê lê bên heta ku êdî ne çi şûr û xincer ne ji çi gule lê biçe. Ji ber wê kes di fetise, di xeniqe, di teqe lê ew nizane çi bike, ji ber ku çi cihê ku ew biçe lê nîne. Ji ber pêstûriyên civakê dunya li wî/wê teng dibe. Gelo ma kesî çi kiriye ku heta civak evqasî di ser de diçe û jiyanê lê teng dike? Gelo ma hinga mirovek bi lingekî kulek, bi çermekî reş, bi çavin hûr, bi bejneke qut, bi difinekî mezin û hwd bê li ser dinê, çi gunehê wî/ê kesî heye ku heta civak ji ber wan xweseriyên wan hinde li ser wan de diçe, likaman li wan dike, dilê wan kesan ji wan reş dike? Gelo ma wan kesan ew xweseriyên xwe bijartine? Ma heke wan bi xwe bijartibiyan wê ne tiştên herî baş ji xwe re bi bijartan? Belê. Lê civak ji ber wan xweseriyên wan kesan tevzê xwe li wan dike, bi wan dikene, her tim wan xweseriyên wan yên li gorî wan “kêmasî” dide rûyê wan û bi derûniya wan dilîze û wan xweseriyên wan qebûl nake. Gelo dema mirov bi wan likamên neyînî gazî hinekan dike, mirov dizane ew çi qeder li wan nexweş tê û li zora wan diçe? Bi taybetî jî ji bo zarokan ev tiştekî gelekî girînge û li ser derûniya wan bandoreke gelek xirab dike. Dema mirov bi likaman banî zarokan dike ew gelekî bi wê di şikên, ji xwe bê bawer dibin, xwe di nav zarokan de, civakê de kêm dibînin. Dema mirov dibêjin zarokekê vî yê/vê ya “reş”, yan ji vî yê/vê ya kirêt hûn dizanin keseyatiya wan zarokan çi qeder di perçiqe û ew çiqes xemgîn dibin? Ya rast em di vî warî de civakekî gelekî xemsarin û em hayî ji derûniya zarokan namînin. Em civakeke ku ji ber xweseriyên kesan likaman li wan dikin, xweseriyên wan, keseyatiya wan tune hesap dikin û jiyana wan serûbin dikin. Divê civaka me di vî warî de pitir haydar be û ji ber şikl û şemalê zarokên xwe ji em çi likaman li wan nekin. Divê ji ber xweseriyên zarokan em çi ferq û cudahiyê nexin di nava wan de û em wan bi hemû xweseriyên wan ve bi pejirînin.

Dewleta tirkî û şerê avê

Şivan Xelîl/Qamişlo

Ji 27ê Çileya îsal ve, dewleta dagirker a tirkî dest danî ser 80% ji ava Çemê Firatê. Piştî ku Enqerê di salên berê de bend û projeyên xwe li qeraxên çemê Dîcle û Firat çêkirin, çavkaniyên avê kontrol kirin û serweriya xwe li ser deverên sînorê cîranên xwe ferz kirin. Mihemed Emîn Nayîmî li ser vê yeke dîyar kir ku, ew sucên Tirkiyê dişopînin û belge dikin.

Endamê Yekitiya Parêzerên Kantona Cizîrê Mihemed Emîn Neyîmî derbarê kiryarên dewleta Tirkî yên li dijî mafên mirovahî ji me re axîvî û wiha got: "Dewleta Tirkî bi kiryarên xwe û bi şêvazê şerê dike, hemû zagonên navneteweyî binpê dike. Wek qutkirinq ava Firatê li ser bi milyona însan. Herkes dizane ku çemê Firatê çemekî navneteweyî, ji dewletekê derbasî dewleteke din dibe. Lewra nabe ku, dewleta Tirkiye bi tena xwe ava çem bixe bin serweriya xwe û tehekumê bi rêjeya ava Firatê bike."

Neyîm di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku dewleta Tirkî bi kiryarên xwe yên hovanê tola binkeftina çeteyên DAIŞê li gelê bakur û rojhilata Sûrî vedike û wiha pêda çû:"Ji demên berê de jî, dewleta Tirkî vê yekê dike. Li beranberî destkeftîyên gele Kurd, dewleta dagirker ya Tirkî bi hêrs xistiye. Ji ber wê jî berê xwe dide deverên din û avê weke kaxeza zextê li dijî gel bikar tîne. Ev yek sûcê şere û yê herî giran li dijî mirovahiyê ye. Ev yek ne li gorî pîvanên navneteweyî ye. Her wiha xala 5an ji madeya 52`an ji hevpeymana 4an ya Cinêv re di sala 1949`an de binpê dike. Ev her du sûc têrê dike ku Meclisa Ewlehiyê ya navneteweyî bang li dewleta Tirkî bike û hesab jê bixwaze.

Parêzer Emîn Neyîmî wiha berdawamî da axiftinên xwe: "Dozgeriya giştî ya NY`yê ya mafên Mirovan jî dikarin bi van dozan sûcên dewleta Tirkî bisekinînin. Ji ber girtina avê rengek ji rengê qirkirina xwezay û mirovahiyê ye. Sûcên ku dewleta Tirk dike ne tenê li dijî gelê Rojava ye. Dijî mirovahî, xwaze û lawira ye. Li gorî hevpeymana sîstema Roma, ya ku di 17`ê Tîrmeha 1998`an de li ser dadgeha cînayatên navneteweyî hatî diyarkirin, sedê sed dewleta Tirk ji aliye kiryarên xwe ku yêk jî girtina avê de sûcdar e. Di sala 2018`an êrişî Efrînê kir û ew dagir kir. Gelê herêmê 58 rojan li berxwe da û berxwedaniyeke bê hempa meşand. Paşê Girê Spî û Serêkaniyê jî dagir kir û ev jî li gorî zagonên navneteweyî sûcekî pir girane. Rojane sûcên herî qirêj û dermirovî li herêmên dagirkî pêk tên. Ev hemû sûcên navneteweyî ne û li beramberîvê heya dawî bêdengî heye."

Mihemed Emîn Neyîm got ku ev sûc hemû li dijî gelê Kurd tênê kirin, ji ber ku pergala gelê Kurd ya tekoşîna azadîyê, banga mafên xwe û mafên hemû gelên bindest dike. Ji bo wê dewleta Tirkî jî êrişê destkeftîyên gelê Kurd giş dike.

Endamê Yekitiya Parêzeran a herêma Cizîrê Mihemed Emîn Neyîm bi van gotina nirxandina xwe bi dawî kir: "Dewleta Tirkî ji projeya Rêveberiya Xweser, Netewa Demokratîk, ji Jiyana Hevbeş ditirse. Ji ber ku ewê ji demên berê de xwe li ser desthilatdarî û binpêkirina mafên gelan ava kiriye. Ew dixwaze ku Kurd tune bibin, ji ber Kurd serkêşên vê projeyê ne. Meclisa Ewlehiya ya Navneteweyî erka xwe pêk neanî, ji ber girêdanên wan di aliyê aborî û siyasî de hene. Ji bo berjewendiyên xwe, dikarin tevahî cîhanê bihejînin. Lê heger mafên gelan werin binpêkirin çavên xwe digrin. Ji berk u ev yek li gorî berjewendiyên wa ye. Divê mafê mirovan ji bo meclisa ewlehiyê di ser her tiştî re be , lê minxabin beravajî vê yeke ye. Em weke Yekitiya Parêzeran a herêma Cizîrê, em her tiştî û her sûcî dişopînin û belge dikin. Têkiliyên me gihaştin asta ku em belgeyên xwe wergerînin bi zimanê înglizî û radestî hiqûqnas û şopdarên mafên mirovane. Em li hêvî ne ku belgekirina qutkirina avê jî radestî wan bikin."

2 Çirûsk: Mazlûm Dogan û Gerîla

Farûk SAKIK

Nivîskar Fuat Kav, di pirtûka xwe ya 'Mirovên Wêrek' de wiha behsa şehadeta Mazlûm Dogan dike: " Li zîndana Amedê pêvajoya herî tarî bû. Taritîyeke zifirî bû. Herkes li rê û rêbazeke xilasiyê digeriya lê nedidît. Çavê herkesî li ser Mazlûm bû. Ew di wê zifiriyê de çirûskek bû, herkesî li wê dinêrî. Mazlum jî ev yek dizanîbû û bi şehadeta xwe ev çirûsk mezin kir û cesaret da herkesî"

Îro Kurdistan jî wek salên 80'yî di pêvajoyeke tarîtiyê de derbas dibe. Dewleta Tirk a dagirker plana xwe ya qirkirina kurdan derxistiye aşta herî jor. Bi êrişên siyasî hemû siyasetvan hatine zîndankirin. Dest danîne ser hemû destketiyên kurdan. Di warê çekdarî de bi POH, JOH, bekçî, polîs, sîxûr, kamerayên mobîl hemû bajêr û kolan xistine bin kontrola xwe. Li gundan jî dema ku li dijî gerîla êriş dida destpêkirin, derketinan derveyî gund qedexe dikir. Êrişên xwe bi bakûrê Kurdistanê sînorkirî nehişt midaxleyî hemû parçeyên Kurdistanê kir.

Di demekî wiha di tarîtiya zifirî de, weke Mazlûm Dogan evcar hêvî û çirûska xilasiyê gerîlayê azadiya Kurdistanê bûn. Îro şerê di navbera artêşa dewleta Tirk a dagirker û gerîlayê azadiya Kurdistanê derbasî qonaxeke nû bû.

Şer, ji bo her du aliyan jî bûye şerê mayîn an nemanê. Faşîzma Erdogan li Tirkiyê û li cîhanê hatibû aşteke wisa ku êdî ber bi tunebûnê ve diçû. Erdogan ji bo desthilatdariya xwe bidomîne yek çareserî dît û êrişî kurdan kir. Şerê ku bi salan bû derbasî merhaleyeke nû kir. Qeyrana aborî, bêqîmet bûna perê Tirkiyê, ji bo wî xem nebû. Ew bi taya parastina qesra xwe ketibû. Bapîrên wî û hikûmetên berî wî jî di demên wiha de êrişî kurdan kiribûn û civaka xwe bi vî awayî bêdeng kiribûn. Wî jî wisa kir û li dû rêça wan ket.

Di sala 2020'an de peymaneke bi navê 'Peymana Şengalê' di navbera Baxda û Hewlêrê de dabû îmzekirin. Li gorî vê peymanê ji xwe re jî hin destûr û îcazeya êrişên xaka Iraqê girtibû.

Li Garê ceriband, bi ser neket û têk çû. Gêj bû. Piştî têkçûna Garê ji bo êrişeke din amadekariyan kir. Her çiqas têkçûna Garê xistibû stûyê dewletê jî lê herkesî ew tewanbar dikir û di vê têkçûnê de ew berpirsyar didîtin.

Dema, bi artêşeke ku di Garê de têk çûye û bê moral e, di 23'yê Nîsanê de êrişî herêma Metînan, Zap û Avaşîn kir, gerîlayên azadiya Kurdistan ku bi serkeftina Garê xwedî moraleke mezin li benda wan bûn. Bi teknîkeke xurt û bi hemû amûrên şer ên pêşketî dema hatin Herêmên Parastinê yên Medyayê, gerîla bi Pêngava Bazên Zagrosan û Cenga Avaşînê derbeyên giran li wan dan. Artêşa Tirk a dagirker gelek windahiyên xwe hebûn û îroj ji bo ji herêmê vekişe, li rêyek û li serkeftinek sexte, digere. Naxwazê wek Garê destvala vegere malê.

Belê li zîndana Amedê çawa ku girtiyan Mazlum weke hêvî dîtibûn û ji çalakiya wî moral û motîvasyona berxwedanê girtibûn, îro jî navê wê çirûskê û navê Mazlûm Dagan, gerîlayên azadiya Kurdistanê ye.

Li Kurdistan û li derveyî Kurdistan kurd û dostên wan baweriyeke mezin bi gerîla tînin. Ya ku dewleta Tirk a dagirker ditîrsîne jî ev bawerî ye.

Nêzîkbûna cejna Remezanê û bihabûn

Lêzan EVDIKÊ/Qamişlo

Ber bi nêzîkbûna cejna Remezanê, welatî berê xwe didin sûkê û pîwîstiyên cejnê dikirin. Lê ji ber qeyrana aborî, welatî nikarin weke her sal pêdiviyên xwe pêk bînin û li ser vê şêneyên qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

"ZAROK TINEBÛNÊ NIZANIN"

Şêneya ya bi navê Kewser Nayif li ser bihayên pîwîstiyên cejnê got: " Weke tê zanîn ku ji pêvîstiyên cejna remezanê kirîna şekeran û cilên nû ye. Lê gelek welatî ji ber xizaniyê nikarin pêdeviyên cejnê bikirin. Lewre êdî her tişt li gor bilindbûna dolar giran bû. Lê dema ku dolar daket jî nirxê het tiştî wek xwe ma û bi eynê bihayê pêdivî têne firotin. Em pir zehmetiyê dikêşînin, lê zarok tinebûnê nizanin. çav li cilê zarokên din dikevin û mîna wan dixwazin, em jî nikarin dilê zarokên xwe bihêlin û neçarî kirînê dimînin. Reş çiqas asteng jî be, em hevil didin ku kêfekê bixin dilên wan zarokan."

Kewser hêviyên xwe diyar kir ku danîna sensor ji bo kontirolkirina nirxên hebe ku gel bikaribe cejna xwe wek her sal pîroz bike.

"BIRYARA QEDEXÊ TÊ BINPÊKIRIN"

Li ser heman mijarê welatiya bajarê Qamişlo, Meryem Hesen wiha got: "Raste ku ji pêwîstiyên cejnê kirîna cilên nû ye, lê îsal ji ber bihabûna bê sînor, me cil tenê ji zarokên piçûk re karî bikirin. Herwiha me ne şekir, ne jî şêranayî kirî. Lê dîsa jî rûxmê vê bihabûnê û bi biryara qedexeya beşî jî, gel bi jimarên mezin kolanên sûkê tijî dikin. Di nêrîna min de ev qedexe bê sûd e. Ji ber ku piştî seat 7ê êvarê bazêr tê girtin û gel neçarin ku li pêwîstiyên cejnê ji sibehê ta seata qedexeyê peydabikin û bi van kombûnên mezin korona hê zêdetir belav dibe."

"YÊN WEKE ME PENABER NIKARIN KEYF BIKIN"

Şahîn Xelîl, penaberê bajarê Efrînê jî got: "Yên weke me penaber nikarin keyf bikin. Ev sê sal in, ez li Qamişlo dijîm û malbateke mezin di perpirsyariya min de ye. Piştî dagîrkirina Efrînê ez hema dikarim pîwîstiyên girîng peyda bikin. Wek kirya malê, dermanên zarokên min, xwarin û vexwarin. Sê salin me cejna remezanê pîroz ne kiriye. Tenê ez hêviya vegera li ser axa xwe dikim da ku kêf bibe mafê me jî."

Jinê ji tinebûnê hebûn afirand

Jiyan BOZO/Qamişlo

Ji bo em analîzeke rast li ser rewşa jina ku li Sûrî dijî bidin, divê em dîrokê baş analîz bikin. Çimkî heqîqeta kû em lê digerin di nava rûpelê dîrokê de hatiyê wendakirin û li gorî berjewendiyên hêzên serdest biçîmeke nû hatiye dayîn.

HETA KU JIN AZAD NEBE CIVAK AZAD NABE

Di tevayiya sîstemên heyî de mafê jinê hatiye wendakirin. Lê li Sûrî bi rengekî cûda û pir nerim ev yek dihat kirin. Hikûmet û destûrên ku Sûrî bi rêvebirine tevan, jin ji mafê wê yê biryar dayînê bê parkirine. Rêjeya jinê di perleman de %12 ye, di hikûmetê de%7, di hêla dîblomasî de %11 ye. Her tim rêjeyeke pir kêm dane wê. Jina Sûrî jineke pir jîr û zanaye. Xwedî birîkîmeke îdolojîk e. Di qadin jiyanê tevan xwedî nerîneke kûre. Lê ji sala 1946an heta roja me ya îro, ji piraniya mafê xwe bê par maye. Bi hatina rêjîma Beis ev yek hê zêdetir bû. Rolê ku dan jinê, pir kêm e û her tim jî dibin serdestiya zilam de ye. Tevî ku pir guhertin di destûra Sûrî de hat çêkirin jî, lê mafê jinê ji bo serrokatiyê bibin nemzet tine bû. Çimkî di şertê nemzetiyê de divê namzet zilam be. Ev hişmendi dide dîyarkirin ku hikûmet jinê piçûk û tine dibîne.

Paya bilind ku jinê di nava hikûmeta Sûrî de girtiye cîgrê serokkomar e, ew jî ji hêla çandî ve ye. Herwiha ji tevayiya payên rêveberiyê yên bilind hat mehrûmkirin. Ji destpêka aloziya Sûrî de kiryar li dijî jinan zêdetir bûn, êdî ji maf û biryardayînê tam hate dûrxistin. Ev yek jî bi zanebûn hat kirin. Çimkî tevayiya hêzên serdest yên li cîhanê ji zanist û hêza jinê ditirsin. Ji ber ku dizanin ku jin mafê xwe bi dest bixe, wê desthilata wan hilweşe û civakeke nû wê bi destê jinê pêş bikeve. Ev yek ji sala 2011an ve li bakur û rojhilatê Sûrî misoger bû. Çimkî jinên vê herêmê şoreşeke nû pêşxistin. Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê di her qadê de bi biryardariyeke mizin rol listin û mafê xwe yê rewa bi dest xistin. Di berdêla vê yekê de jî bi hezaran şehîd hatin dayîn.

Jinan karêbûn kevneşopiyên heyî tevan bişkînin û civakeke exlaqî û politîk pêş bixin. Rêveberiya Xweserya ku bi pêkhatiya wekhevî avabûye li her qadî bîştgireke mezin da jinê. Tevaiyaya sazî û deste bi sîstema hevserokatî hatin avakirin. Tevî êrîşên ku li ser herêmê û bi taybetî yên ser jinê tên kirin, jina bakûr û rojhilatê Sûrî bi hêza xwe ya leşgerî û siyasî li seranserî cîhanê bû mîneka jina azad. Mirov pir rehet dikare bêje ku janên vê herêmê jiyana xwe li ser bingehekî baş û xurt ava kirine û tevî zor û zehmetiyan jî serî danayîne. Ev yek jî mîrasa keda Rêber Apo ye, ku azadiya jinê kir bingehê şoreşa gelan. bi vê gotina wî jî mirov dikare piştrast bike; 'heta ku jin azad nebe civak azad nabe.' Ji bo wê jî jinan ev yek ji xwe re kirin armanc û li ser bingehê neteweya demokratîk û jiyana hevbeş şoreşa xwe li darxistin û biserketin.

Komîteya Aborî ya Jinan hilberînên projeyên xwe daxistin sûkan

Komîteya Aborî ya Jinan ya herêma Dêrikê hilberînên projeyên çandiniyê daxistin nava sûkan. Li aliyekî din berpirsa projeyê diyar kir ku pêkanîna mîna van projeyan wê pêwîstiya herêmê ya sebzeyên havînê pêk bîne.

Komîteya Aborî ya Jinan ya herêma Dêrikê ya kantona Qamişlo, di demeke kin de gelek destkeftî bi dest xistin û projeyên xwe firehtir kirin ku gelek jin tê de dixebitin. Di vê dawiyê de hilberînên projeyên çandiniyê daxistin nava sûkan.

Komîteyê 7 hektar pîvaz, 12 hektar sîr, 3 hektar bezalya, 2 hektar baqil, 5 hektar petat li gundê Kendal û Mele Merzê yên herêma Dêrikê çandin.

Berî 8 mehan komîteyê dest bi projeyeke çandiniyê kir ku sebzeyên havîn û zivistanê biçîne. Ji bo wê 50 hektar bi cureyên cuda mîna baqil, bezalya, pîvaz û sîr çandin. Herwiha petat jî çandin ku cara yekê ye li herêmê tên çandin.

Komîteyî di mehekê de dest bi çinîna hilberînên bezalya, baqil û xesan kir û daxistin nava sûka Dêrikê.

Miqdarê hilberîna bezalya mehane 18 ton û xes gihîşt 4 tonan. Heke pêwîstiya sûkên Dêrikê bi temamî hat dabînkirin, hilberîna zêde wê bişînin bajarên din.

Karker ku piraniya wan jin in bezalya, baqil û xes ji saetên sibehê ve û heta êvarê diçinin. Destheqê her yekê li gorî saetên kar di navbera 4 hezar û 5 hezar lîreyên Sûriyê de ye. Di projeyê de 100 karkerên jin kar dikin.

Berpirsa projeyê Wedha Mihemed got, "Armanca sereke ya projeyê, peydakirina derfetên kar, pêkanîna rêgeza xwexwedîkirinê û zêdekirina hilberîna xwecihî ya herêmê ye. Herwiha em dixwazin keysbaziya bazirganan bişkînin li gel pêla bihabûnê ya li herêmê û pêwîstiya herêmê ya sebzeyên havîn û zivistanê peyda bikin."

ANHA

Gerîla Tevgera Azadiya Gelê Kurd e

Gulîstan Xalid

Dagirkeriya dewleta tirk, herdem dixwaze di rojên taybet de pîlanên xwe yê êrîşên li ser gelê kurd pêk bîne. Ya rastî bi vê yekê rûreşiyên xwe, zilma xwe, rastiya xwe ya faşîst û dagirker bi bîrdixînin û careke din zindî dike. Tenê em qala çend buyên ku tê de hemwextiya êrîşên xwe hildibijêre, bikin. Di 9'ê cotmeha sala 1919 de dagirkeriya dewleta tirk dest bi êrîşên li ser herêmên bakur û rojhilatê sûriye kir, ku di encama wê de bajarê Serêkaniyê û Girêspî dagirkirin. Em dizanin ku 9'ê cotmehê ji bo gelê kurd herdem bûye dîrokeke ku destpêka komploya navneteweyî ya li ser Rêber Abdullah Ocalane û Rêber Abdullah Ocalan di 9'ê cotmeha sala 1999 ji Sûriye derketiye.

Em qala buyereke din ya herî nêzik bikin, êrîşên ku di 24'ê Nîsanê de, li ser herêmên parastina medyayê pêkhatin, ku di salvegeriya qirkirina 106an ya gelê Ermen de bû. Ew jî bi destê dewleta tirkî ya imparatoriya Osmaniyan de di sala 1915 de pêkhatibû.

Di 6'ê Gulana sala 1972'an de, dewleta tirk sê şoreşgerên Tirkiyê; Denîz Gezmiş, Yûsif Aslan û Hûseyîn Înan li girtîgeha sergirtî ya navenda Enqerê bidarve kirin. Di van rojên ku em rastî salvegera komploya 6'ê Gulanê, ya ku di sala 1996'an de dewleta trik li Şamê li dijî Rêber Abdullah Ocalan, êrîşeke sekvanî pêk anîbû. Gelek buyer hene ku em birêz bikin da ku vê rêbaza dewleta tirk şirove bikin û dijminatiya wê ya ji gelê kurd re raxînin ber çavan.

Dewleta tirk dixwaze herdem vê bibîr bixe û ji gelê kurd re jî vê bêje; 'ma nayê bîra te min di vê dîrokê de çikir, min qirkirina geleke weke Ermen pêk anî bû, min rêberê we Abdullah Ocalan bi hevkariya hin hêzan di Sûriye de tengav kir, min sê şoreşgerên welatê xwe bixwe di vê dîrokê de darvekiribûn.' Yanî herdem dixwaze gelê kurd bê îrade bike û biçavtirsandinê bitepisîne.

Lê dewleta tirk ya ku nikare faam bike û rast şirove bike ewe ku, kurd jî ne kurdê berê ne. Gelê kurd xwe guherand, xwe pêş xist, zane û bi rêxistin kir, bi îrade kir; bi hebûn, bi felsefe û baweriî kir. Perdeya faşizmê û hêrsa desthilatdariyê, cavê dewleta Tirk ya dagirker û mejiyê wê kor kiriye. Nikare vê rastiyê bi zelalî bibîne. Nikare ji derveyî ya ku ew dixwaze û hedef dike, qebûl bike. Li gel ku ev 40 sal zêdetire gelek caran vala derketiye û heya weke ku kurd dibêjin li berxwe nakeve. Bi qasî ku êrîş dike, derbe li ser derbeyan jî dixwe. Piştî binkeftina xwe ya di oparasyona Garê (ku despêka binkeftinê ye) de careke din êrîşî gerîlayên tevgera azadiyê dike, da ku binkeftina xwe ya danqurtandiye telafî bike. Lê dîsa jî derbeyan dixwe û ewê hîn jî bixwe.

Ger ev êrîşên dewleta tirk hezar saleke din dewam bike jî, ewê berxwedaniya gerîlla jî berdewam bike û tu carî naqede. Jiber gerilla tevgera azadiya gelê kurd e, ev têkoşîn bi gerîlla tenê jî mabe wê her bidome û biserkeve.

"Erdogan di çavên çeteyên DAIŞê de xewna vegera dewleta Osmanî dibîne" Beşa 2

Serbest EHMED/Qamişlo

Çeteyên DAIŞê di xizmeta proje û berjewendiyên Dewleta tirkî de roleke mezin girtibûn. Lê piştî şkestina wan ji aliyê QSDê ve, projeyên Tirkiyê ketin xeterê. Li gorî çavdêran; Erdogan ji bo berdewama projeyên xwe, baregehan li başûrê Kurdistanê ava dike û bi riya komên çete yên girêdayî xwe, DAIŞê zindî dike.

BAREGEH Û ÊRIŞÊN TIRKIYÊ YÊN LI IRAQÊ HÊZÊ DIDIN DAIŞÊ

Zêdebûna êrişên çeteyên DAIŞ li Iraq û başûrê Kurdistanê rojbiroj zêdetir dibe. Şirovekarê siyasî Edalet Ebdulah diyar kir ku çapemeniya Iraqê, zêdebûna tevgera çeteyên DAIŞê bi rengekî berbiçav vedişêre û wiha axaftina xwe bi rêz kir: "Çeteyên DAIŞê bênavber çalakiyên xwe yên terorîst dewam dike. Herî zêde jî li herêmên naverastê iraqê û sînorên herêma Kurdistanê, çeteyên wa yên veşartî hene. Çeteyan Bi êrişên xwe zirareke mezin hem li hêzên ewlehiyê, hem jî li sîvîlan dike. Ji xwe tê zanîn ku baragehên Tirkiyê li wan herêman jî hene û çavên wê li Musil û Kerkûk ye. Ev yek digel zêdebûna tevgera çeteyên DAIŞê, gumaneke mezin çêdike. Berî niha tê zanîn ku Tirkî bi gelek riyan, rê û pêşgirî dabû çeteyên DAIŞê û zêdebûna şaneyên DAIŞê û hebûna baragehên Tirkiyê teqez bi hev girêdayî ne."

LI SERANSERÊ ROJHILATA NAVÎ ERDOGAN Û ÇETEYÊN XWE

Têkildarî heman mijarê, lêkolînerê Misrî yê Çavdêrê Tevgera Komên Radîkal Munîr Edîb, diyar kir ku DAIŞ bi rengekî rêxistinî bi dawî bû, lê ev yek teqez nake ku tevger û êrişên wê neman e. Herwiha Edîb destnîşan kirk u dewamiya hebûna çeteyên DAIŞê jî, nayê wataya ku hêza xurt ya vê rêxistinê ye. Lewazbûna desthilatên siyasî li hin welatan jî, derfeteke ji bo êrişên xwe dibîne. Ji ber wê li rojhilata navî û li bakurê Efrîqayê jîngeheke guncav jê re heye.

Edîb derbarê rola rejîma Tirkî, di pêşgirîya hebûna van çeteyan li seranserê Rojhilata Navî de wiha nirxand: "Sedema sereke ji mayîna DAIŞê re ewe ku, projeyên çeteyan li gel yên Erdogan guncaw in. Erdogan xewna vegerandina dewleta Osmanî, di çav û li ser destê van çeteyan de dibîne. Ji ber wê di 2014an de alîgiriya wê ji DAIŞ re hat xuyakirin. Lê piştî 2018an stratîjiya xwe guhert û niha bi rengekî fermî alîkariya çeteyên radîkal(Cebhet EL-Nusra û çeteyên Sûrî) dike. Van komên radîkal li Sûrî, Lîbiyayê û Seranserê cîhanê ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne. Fikirê Komên radîkal jî ne kêmî yê DAIŞê ne. Helbet Erdogan ne bi serê xwe vî karî dike. Ev yek bi erêniya Emerîka tê kirin. Jixwe avakirina bingeha DAIŞê jî, bi destê wê hat kirin."

"DIVÊ PIŞTGIRYA SIYASÎ Û LEŞKERÎ JI HÊZÊN ŞERÊ DAIŞÊ KIRÎN RE, HEBE"

Munîr Edîb herwiha bal kişand li ser rola Hêzên Sûriya Demokrat di şerê hemberê DAIŞê de û gotinên xwe wiha anîn ziman: "DAIŞ li ser destê QSD şkest. Operasyonên QSD û hêzên Iraqî li dijî çeteyên wê dewam dikin û heta astekê, tevgera DAIŞê sînordar kirin. Lê hebûna dewletên weke Tirkî, ku ji berjewendiyên xwe alîkariya çeteyên radîkal dike, gumana vegerandina DAIŞ derdixe holê. Eger civaka navnteweyî bixwaze gumanên vegera DAIŞê li ser xwe rake, divê destpêkî pêşgiriyeke lêşker û siyasî bide wê hêza ku şerê DAIŞê kirî. Herwiha li ser asta cihanê stratîjiyeke hevbeş divê çêbe û şerê fikirê DAIŞê bike û rê nede dewletên weke Tirkî, ku çeteyan ji bo xizmeta projeyên xwe yên dagîrkeriyê bikar bînе."

"JI NÊZ VE"

Daxuyaniya Kawa Ezîzî û sergêjiya ENKS`ê!

Ednan Mustafa

Insyatîfa QSD`ê ya ji bo destpêkirina diyaloga di navbera PYNK û ENKS`e de, salek li piştxwe hişt. Bê gûman di va qûnaxa derbasbûyî de gelek xalên ku li ser nîqaş pêşketin. ji van xalan wek perensîb lihevhatinek çêbû û nav lê hat kirin, qûnaxa yekemîn ji hevdîtinan. Di qûnaxa du`yem a ji hevdîtinên di navbera herdu aliyan de, her çiqas etmosferek erênî derxîst holê jî, lê di bingeha xwe de gelek nîqaş, gengeşe û nakokî derketin ser rûyê erdê. Lê di esas de aliye ku yekîtî dixwez û di çarçoveya civaka kurd de yekbûna Gelê Kurd daye avakirin û weke pirojeyek siyasî ya xweseriya demokratîk pêşkêş kirî diyar bûye. Aliyê din jî ku her gave bi hincetên cûda, bi daxwazên cûda weke ku erbane xistine pêşiya hespê naxwezin ev yekîtî pêş bikeve derketiye hole.`

"Çima ENKS Yekîtiyê Naxweze"

Enks`ê di va pêvajoya derbas bûyî de gelek hewildan kir ku va diyalogê helweşîne û nebe serî, lê ji ber beşek ji vê diyalogê weke Emerîka û Firanse xwe gerantorê vê yekîtiyê dane nîşandin, dibe sedem ku bi eşkeryî nikarin diyalogên xwe bi PYNK re bi dawî bikin. Ji ber vê yekê bi şertên tacîzî û dûrî aqil her gave ev xistin rojeva hevdîtinan. Wek mînak bidawî anîna perwerdeya Kurdî, dij erka xweparastinê derketn û di sîstema hevseroketî û derbazbûna (leşkerên roj) ji Rojava re weke mercên sereke dide îfade kirin. Çawa ku Roj ji me ve xûyaye, ev daxwazên ENKS`e jî ne daxwazên bi tewafiqên hûndrîn, beşek ji ENKS`e ku ji rastiya civaka Kurd û rastiya Şoreşa Rojava dûr û bi ecindeyên aliyên derve û PDK`e van daxwazan ferz dikin. Di heman çarçoveyê de zexta opizîsyona Sûrî û rayedarên Tirk beşek ji van zextên li ser ENKS`e ye ku li Bakur- Rojhilatî Sûrî yekîtiya Gelê Kurd neyê saz kirin.

"Sergêjiya ENKS'ê"

Daxuyaniyên dawî ku ji aliyê nûnerê Emerîka ji bo pêkanîna diyalogê diyar kiribû ku yekîtî bê ENKS`ê jî dibe, vê yekê him di ENKS`e de him jî di PDK`e de sergêjiyek da avakirin, ji lewre di serî de rayedarên PDK`e ketin hewildanê ku çawa bingeha xerab kirina vê diyalogê avabikin, ji bo vê jî hin gav avêtin. Gava yekemîn di dema serdana nûnerê Emerîka Deyvd Brawnshten ji herêma Kurdistan re, serokê PDK`e Mesûd Berzanî û kurê wî serokê Hikûmetê Mesrur Berzanî di van hevdîtinan de şertê yekemîn ku dane diyar kirin, derketina PKK ji Rojava bû. Ji dewla ku piştgirî û hêz bidin diyalokê, PKK`e xistin rojeva Emerîka şerta du`yem Di heman çarçoveyî de, rê dan faşizma Tirk ku li dijî şervanên PKK`ê li herêma Kurdistan li rex Tirkan ref girtin.

"Daxuyaniya Ezîzî ne ji rêzê ye"

Ev hewildanên ku li jor me bi lêvkirin li aliyekî, daxûyaniya serkerteyê ENKS`e Kawa Azîzî bi riya ARK TV di esasê xwe de niyeta ENKS'ê derxîst holê. Tişta ku PDK`e û ENKS`e ferz dikir "yan wek min, yan jî xerab kirin", nikar bi serxista vê care bi kesekî weke KAWA Azîzî dane gotin û ew derxîst ser ekrané û bi zimanekî hîn zelal û vekirîtir banga ŞERÊ NAVXWYÎ LI ROJAVA kir. Bi vê yekê tê nekir, rêveberê şandeya PYNK`e Aldar Xelîl tehdîd kir. Dema Azîzî dibêje ku ma qey dibançeyek me jî nine ku em şer bikin?, ma qey em jî nikarin navebdên wan bişewitînin? Gelo ev vexwendineke ji şer re li Rojava ye?

"Ev hilbijartin ne rewa ye"

Navenda Nûçeyan/Qamişlo

Îbrahîm Qeftan diyar kir ku wek gelên Sûrî û Partiya Sûrî ya Paşrojê, baweriya wa bi van hilbijartinan nayê û destnîşan kir ku ev hilbijartine, qanûn û rêgezên navneteweyî, biryarên Cinevê û yên Komîtaya Destûrî tevan bin pê dike.

Hilbijartinên Sûrî her 7 salan carekê tên lidarxistin. Ji sala 2000an de Beşar El-Esed serokkomariya Sûriyê dike. ji bo ku karibe serokatiyê bike, du carî destûra welat hat guhertin. Di pêvajoya Bihara Gelan de li beranberî desthilata rejîmê jî li Sûriyê alozî derketin. Bi milyonan koçber bûn û bi sedhezaran jî, hatin kuştin. Lê tevî vê yekê jî careke din Beşar El-Esed ji bo serok komariyê dibe nazet û bi pişgiriya %40ê desthilata rêjîmê serkeftin axwe îlan dike!

"EV HILBIJARTIN BIRYARÊN NAVNETEWEYÎ BINPÊ DIKE"

Derbarê mijarê, Serokê Partiya Sûrî ya Paşrojê Îbrahîm Qeftan ev nirxandin kirin: "Bê gûman destpêkê em wek gelê Sûrî û Partiya Sûrî ya Paşrojê van hilbijartinan qebûl nakin. Ji ber koçberiya li hûndir û derveyî Sûriyê, ev hilbijartin nûnertiya gelê Sûrî nake. Ev yek me matmayî dihêle, ka bi çimafî rêjîm dixwaze hilbijartina çêke ku niha xaka Sûrî ji hêla dewleta Tirkî û çeteyên wê ve dagîrkirî ye. Herwiha herêmên bakur û rojhilatê Sûrî jî ne dibin desthilata wan de ye. Ev tê wateya ku zêdetirî %40 ne dibin desthilata rêjîmê de ye. Em dizanin ku heta niha, ew pişta xwe bi Îran û Rûsiya xurt dike. Ev hêz jî, tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikin. Ji bo wê em dibêjin ev hilbijartin wê alaziya Sûrî kûrtir bike. Çimkî ev hilbijartin biryarên navneteweyî, bi taybetî biryara navneteweyî ya 2254(amadekirina destûreke nû ku tevayiya gelê Sûrî qebûl bike û hilbijartin wê dibin denetima komîteyeke navneteweyî de bên lidarxistin) ku tê de ragihandina hikûmeteke demkî jî heyî bin pê dike."

" JI BO WÎ DU CARAN DESTÛR HAT GUHERTIN"

Îbrahîm Qeftan axaftina xwe bi van gotinan domand: "Niha piskirik ne namzetiya Beşar El-Esed e, yan jî kesek din. Îbrahîm Qeftan di dawiya axiftina xwe de, di derbarê paşroja bakur û rojhilatê Sûrî de jî wiha got: "Bêgûman pirojeya ku li bakur û rojhilatê Sûrî tê birêvebirin pir baş û ji gelên herêmê re jî bi nirxe. Lê gelek pilan û zextên hêzên dagîrker li ser vê herêmê hene, da ku aramî û hevgirtina herêmê têk bibin. Em di wê baweriyî de ne, çareseriya aloziya Surî tenê bi diyaloga gelên Sûrî û bi platformên Neteweyên Yekbûyî de wê pêk bê."

Em baş dizanin ku, tevayiya pîvan û qanûnên navneteweyî yên derbarî pêşîgirtina alozi-ya Sûrî, tên bin pê kirin. Eger em li namzetiya Beşar El-Esed vegerin, ji sala 2000an ve serokkomariya Sûrî dike. Ji bo wî destûra du caran hat guhertin. 2012an dîsa ev biryar hat guhertin û li gorî biryarê divê temenê serokkomarekî 40 sal be. Ji ber wê em dibînin ku destûra Sûrî li gorî hikûmetê tê birêve birin, ne li gorî berjewendî û daxwaziyên gele. Ji bo wê ev hilbijartin sexten ye."

"Divê em bi vîna xwe ya azad kar bikin"

Sekreterê giştî yê Partiya Demokrata Kurdî ya Sûrî Cemal Şêx Baqî diyar kir ku nirxandinên serkirdeyên ENKSê li ser ragihandinê dikin ne nû ne û Ji destpêka van guftûgoyan ve, bihêrs peyvên derveyî rêzê dikin û êrişî PYNKê dikin.

Jiyan BOZO/Qamişlo

Bi salan e ku gelê Kurd li heviya yakîtiyê ye. Nêzî salekê ye li ser banga fermandarê Giştî yê QSDê Mezlûm Ebdê li rojavayê Kurdistanê ji bo ku gavên dîrokî bên avêtin tekoşîn dike. Li ser vî bingehî PYNK û ENKS dest bi danûstandina kirin. Lê herî daviyê rayedarê ENKSê Kawa Erebo di qenal ARK tv de bi gotinên ku rê li birakujî vedike, êrişê PYNKê kir.

"PÊNGAVA YEKÊ Û DUDUYAN SERKEFTÎ DERBAS BÛN"

Cemal Şêx Baqî wiha axivî: "Nêzî salekê ye denûstandin di nava PYNK û ENKSê de dest pê kiriye. Destpêkê ev danûstandinan di nava PYD û ENKSê de bû. Çimkî ENKS di destpêkê de xwest astengiyan derxe û ev yek du mehan domand. Ji ber ku wan digot 'hin xalên sereke hene, divê em di navbera xwe de çareser bikin.' Piştî wê di 10ê Hizêranê de giftogoyên me, bi rengekî berfirehtir dest pê kir. Li ser sê xalan me li hev kir, yek avakirina lêvegera Kurdî, ya duduyan mijara Rêveberiya Xweser bû û ya sisiyan jî mijara hêzên leşkerî bû. Li ser bingehê rêkeftina Duhokê ev xala hatin erêkirin. Li ser van biryaran me dest bi kar û xebatên yekîtiyê kir. Pêngava yekê û duduyan serkeftî derbasbûn. Lê di xala derbasbûna ENKSê di nava Rêveberiya Xweser de, xwestin tevlîheviyan derxin û doza %50 ji rêveberiyê kirin. Me jî wiha got; 'ev rêveberî ne ya partiyekê tenê ye, tevayiya gelên herêmê têda cî digirin. Ji ber wê ev daxwaze nehat qebûl kirin û demekê giftogeh hatin sekinandin. Lê me careke din dest bi diyalogan kir."

"KESÊN KU NIKARIBIN VÎNA AZAD BI KAR BÎNIN WÊ BIBIN KELEM JÊ RE"

Cemal Şêx Baqî axaftina xwe wiha domand: "Şandeya PYNKê ti astengî li ba nînin. Em ji hertiştî ku bi niqaş û bê çareserkirin hazirin. Lê mixabin ew wiha nêz nabin. Gelek caran li ser hin xalan tevlîheviyan derdixistin. Me jî wiha got 'çi xalên li dervî masa giftogoyan nayên çereserkirin.' Ev çareserî jî tenê wê di navbera PYNEK û ENKS hebe. Em dîsa jî dibêjin deriyê me her tim vekirî ye. Tenê em li ser xalê şkandin û tinekirina Rêveberiya Xweser nîqaş nakin, çimkî ev xeta me ya sor e. Em dizanin ku çavê gel li hêviya me ye. Lê mixabin em jî li hêviya ENKSê ne."

Cemal Şêx Baqî bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Nirxandinên serkirdeyên ENKS li ser ragihandinê dikin ne nû ne. Ji destpêka van giftigoyan de, bi hers û ji dervî rêzê diaxivin û êrişî PYNKê dikin. Lê di dema dawiyê de ne tenê li hemberî PYNK, êdî şerê hev jî dikin. Ev yek eşkere dide diyarkirin ku, ENKS di bin bandora dewleta Tirkî ya dagîrker, PDK û rêjîma Sûriyê de tevdigere. Herwiha dixwazin heceta pêşbixin da ku van hevdîtinan têk bibin. Lê bi van kiryaran nikarin raya giştî û gel bixapînin. Em di biryarên xwe de zelalin. tevlîhevî û du diliya ENKS jî esker ye. Gelê me jî vê yekê baş dizane û dîbîne. Pêvajoya em têde derbas dibin pir girînge, divê em van derfetan winda nekin. Ji ber wê dive em van danûstandinan bi ser bixin. Ev yek erkê me teva ye, ji ber ku derfetên wiha her tim peyda nebin. Ji bo ku em yekêtiyê misoger bikin, divê em bi vîna xwe ya azad kar bikin. kesên ku nikaribe vîna azad bi kar bikin, wê jê re bibin kelem."

"Di şexsê Rêber Apo de gelê Kurd di tecrîdeke giran de ye"

Lêzan EVDIKÊ/Qamişlo

Girankirina tecrîdê li ser Rêber Ocelan, bandoreke mezin li xebat û têkoşîna gelê Kurd dike. Helbet azadiya rêber Ocelan ji bo tevgera siyaseta Kurdan, armanca yekê ye. Ji ber wê jî bandora herî mezin li qada siyasetê dike. Li ser vê yekê Nûran Îmîr destnîşan kir ku bi berdewamîya tekoşînekê bi hêz wê tecrît bişkêt.

ÇIMA TECRÎD!

Li ser sedemên tecrîdkirina Rêber Ocelan û rewşa niha, parlamandera HDP Nûran Îmîr, ji rojnameya me re axivî û gotinên xwe wiha bi lêv kirin; "Di navbera 2013-2015 me bandora fikirê birêz Ocelan li ser Bakûr û Rojavayê Kurdistanê me bi çavê xwe dît. Wî pêvajoyek çareseriyê da destpê kirin û ji aliyê raya giştî jî, ev yek hatibû pejirandin. ji bo serkeftina wê pêvajoyê jî, her kesê banga azadî û aşitiyê dikir. Werwiha herkes di nava hewldan û xebatê de bû. Ji ber ku nêzîkbûna gelan ji fikir û felsefeya birêz Ocelan re zêde. Ji ber ku pergalawî li ser azadî û berjewendiyên gelan bû û ev jî li dijî berjewendiyên sîstema dagirker ya Tirkiyê bû. Lewre rejima faşist ya AKPê ev pêvajo rûxand û dest bi tecrîdek girankirî kir. tişta li hember birêz Ocelan tê kirin, bandor li ser hemû hêzên kurd û alîgirên demokrasiyê dike."

Nûran destnîşan kir ku parêzerên Rêber Ocelan li gor qanûnên Tirkî û yên navnetewî, doza mafê mûwekîlê xwe dikin, lê li beramberî vê li Tirkiyê ti qanûn ne mayîne û wiha pêda çû: "li gor vê bêqanûnê yê, ji bo ku tecrîda giran rabe tekoşîna gel divê di asta herî jorda be."

"BI TECRÎD Û KIRYARÊN FAŞIZMÊ GEL, TEVGERA DEMOKRASIYE Û XEBATA JINÊ DIBIN HEDEF"

Nûran Îmîr bal kişand li ser bandora tecrîdê ya li ser jinan û wiha got: "Dewleta Tirkî ya dagîrker ji Imral'î heta hemû qadên kurd lê dijîn, heman polîtîkayê dimeşîne. Li ser gelê kurd, tevgera siyasî ya HDPê û bi taybetî li ser xabat û sekna jina azad heman êrişan dike. Her roj bi zagonên xwe, qada dijminatiya jinê berfireh dike. Tişta ku sîstema hukûmetê li ser lingan digire, zagonên dewletê bixwe ne. Lewra yek hakim nikare bê serokomar biyarê bide."

"BI TEKOŞÎNÊ WÊ DERIYÊ IMRALIYÊ VEBE"

Parlementera HDP ya Şirnex'ê Nûran Îmîr di dawiya axaftina xwe de bangewazî ji gelê kurd re kir û wiha got: "Bi desthevgirtina gelan û bi itîfaqa gelê kurd emê bikaribin vê tecrîdê bişkînin. Ji ber ku di şexsê rêber Abdullah Ocelan de, ev tecrîd rastarest li ser gelê kurd di her çar parçê Kurdistanê de tê kirin. Tekoşîna û berxwedana gel jî ew ku, bi sedsalane ji bo azadî û statû ya xwe dike. Kurd bi tekoşîna xwe di vê sedsalê de pir nêzî azadî û statû ya xwe bûye. Lewra desthilatdar dixwazin bi êrişên xwe yên hovane, sed salek din li kurdan bidin windakirin. Avakirina HDP bi fikirê Rêber Ocelan bû û sîstema ku îro li Rojavayê Kurdistanê hatiye avkirin jî pergala wî ye. Ji bo wê li hemberî van destkeftiyan êrişên dijwar hene. Her wiha êrişa ya li Şingal û Mexmûr tê kirin jî, bi tecîdê re girêdayi ye. Divê em jî li hember vê dorpêçkirina bi armanca qirkirinê, li her deverê ku em lê jîyan dikin tekoşîna xwe bilind bikin û li deskeftiyên xwe xwedî derkevin. Heta ku Rêberê me azad nebe, divê em jî li hember faşîzmê dest ji tekoşîn û berxwedanê bernedin. Herwiha divê gelên rojhilata navî jî bi rêxistinî xwedî li Rêberê xwe derkevin û bi têkoşîneke bêhempe azadiya Rêberê gelan Abdullah Ocelan misoger bikin."

Welatiyên Qamişlo: Divê hikumeta Başûr rê li ber êrişan bigire

Navenda nûçeyan/Qamişlo

Têkildarî berxwedana gerîla ya li Zap, Avaşîn û Metînayê, welatên bajarê Qamişlo diyar kirin ku ev êriş ne li dijî hêzekê yan partiyekê ye, ev êriş li dijî gelê Kurd e. Herwiha bang li hikumeta Îraq û Başûr kirin ku, divê helwesta xwe li dijî van êrişan zelal bikin.

Dewleta Tirkî ya dagîrker ji 23'yê Nîsana 2021'ê li dijî herêmên parastina medyayê, êrişek daye destpêkirin. Armanc jê ewe ku hebûn û azadiya gelê Kurd qir bike û herêmên wan dagîr bike. Di êrişan de dewleta Tirkî çekên herî giran yên kîmyayî ku di qanûna navneteweyî de qedexeye, bikar tîne.

"HELWESTA HIKUMETA BAŞÛR NE DIYAR E"

Li ser vê mijarê rojnameya me nerînên welatiyên bajarê Qamişlo girt. Welatiya bi navê Emîra Hiso êrişên dewleta Tirkî şermezar kir û wiha got; "Ev şerê ku niha li Zap, Metîna, Avaşîn û Heftanînê tê meşandin, armanc jê dagîrkirina herçar perceyê Kurdistanê ye. Dewleta Tirkî ya dagîrker dixweze bi êrişên xwe yên hovane û desthiladar, gelê Kurd qir bike, lê em dî wê baweriyê dene ku wê planên wê têk biçe. Çimkî xwediyên vê xakê em in."

Li ser helwesta hikumeta Başûr jî Emîra destnîşan kir ku, bêdengiya Başûr li dijî van êrişan cihê mixabiniyê ye û wiha pêde çû: "Heta niha hikumeta Başûr li dijî van êrişan helwesta xwe diyar nekiriye, caran jî xuya dike ku ew piştgiriya vê dagîrkeriyê dike. Cîhan tev zanin ku dijminê gelê Kurd yê berî hezarê sala dewleta Tirkî ye. Em bang li dewletên navneteweyî dikin ku rê li ber vê qirkirinê bigire. Banga me ya herî girîng ji gelê me re ye ku, ji bo têkbirina planên qirêj, têkoşîna xwe xurtir bikin û li xweîna şehîdên xwe xwedî derkevin."

"PÊWÎSTÎ BI YEKÎTIYA GELÊ HERÊMÊ HEYE"

Herwiha welatiyê bi navê Ezîz Umer jî diyar kir ku planên êrişan bi piştgiriya dewletên NATO tê kirin û got; "Di rerwşeke wiha de pêwîste em gelê herêmê çi Ereb, Suryan, Asurî û Kurd yekîtî xwe ava bikin û li hember êrişan helwesta bikin yek. Ji ber ku dewleta Tirkî dixwaze yekîtiya ku li herêmê hatiye avakirin jî têk bibe."

Ezîz Umer axaftina xwe wiha bidawî kir: "Emê heta dawiyê li piştgirê gerîlayên xwe yên ku bi bi lehengiya xwe, dîroka tekoşîna li hember dagîrkeran dinivisînin. Em di wê baweriyê dene ku, wê hêza me planên dagîrkeran têk bibe. Wê serkeftin ya gelê Kurd be, lewra ew xwediyê mafin."